Kesên ku wekî min nafikirin bizin in

Ji dema ku Ehmedî necadî bûye serokê komara Îranê, ji ber nezanî û çand û kultura xwe ya kêm û lawaz, berdewam tiştan diqewimîne ku gotinên wî pir ecêb û balkêş in. Vê dawiyê, serok komarê Îranê Ehmed Nicadî, di dema serdana xwe bo parêzgeha" Xorasana başûr", di nav xelkê de diaxive û ji ber ecêbûna gotinên wî medya û çapemeiyan, beşek ji wan neweşandin. Wî dema ku di nav xelkê bajarê Bîcendê de, diaxive, bi awayekî tund rexne ji neyarên xwe û bi taybetî kesên ku bi awayekî ronakbîrane dijberyê tevî siyasetên wî dikin, bi bizn nav dike û dibêje "

Kesê ku wekî min nafikirin bizin in

Rojnama AGIRÎ Hejmar 75

Dumahk :***Bila bîranînên***

me de nejî di navbera Kurd , Turk û Farisan de jî . Ji dêvla wê , bikaranîna zimanê kurdî zengîn û rengîniyekê dide çandeyên van welatan .

Weke çawa ev mirov , di jiyana xwe de mezin bû , xuya ye , ew di mirina xwe de jî mezin e . Mezinbûna wî salê carekê me li hev dicivîne . Mirovên weha di jiyana xwe de mezin , xuyaye mirov nikare di mijarekê û dudiyan de baş li ser jiyana wî ya curbecur raweste û mafê wê bidiyê û têr bike , û nejî dikare baş kêr û sûdan ji şevêntêne girêdan werbigire .

Ji ber wê , pêşinyara me ji komîta Munteda Nûridîn Zaza re , ewe ku , ji vir wêve şevên bêne lidarxistin carê di bin navnîşaneke bêlikirî de , li ser warekî ji warên jiyana vî camêrî ya giran buha be .

****

36 salî ye û diya 13 zarokan e

Jina Înglîz ya bi navê Joanne Watson zarokê xwe yê 13'mîn anî cîhanê. Tevî ku ew diya 13 zarokan e jî, lê belê hîn weke keçeke ciwan tê dîtin. Rojnameya înglîzî Dailymail di malpera xwe de nivîsand ku temenê Joanne 36 salin û berî hefteyekê bû diya 13'mîn zarok. Mêrê Joanne Watson, John jî 42 salî ye.. Ji wan 13 zarokan 10 keç in. Watson, 46 kîlo ye.

****

Sersala we Pêroz Be

Bi hatina serala 2008 an, komîta rêvebir a Newrozê hemî milatên cîhanê û taybetî a miletê Kurd pîroz dike û bi hêviya saleke azadî û wekhevî ji tevan re be .